

## Ristikek ji 52gulan pêkhatî Di stuyê tevgera kurdî li Sûriyê de!

Rêberê Silivî

Bi hatina roja 14ê Hizêranê, 52 sal ji temenê tevgera me ya Kurd li Sûriyê kuta dibin û ew derbasî pênçî û sê saliya xwe dibe. Bêgomane ku demezirandina Partî Demokratî Kurdistan li ser destê hin kurdperwer, rewşenbîr û xemxurên gel û welat di wê roja bi nîşan ji sala 1957an de, ji ber gelek sedeman, gavake dîrokî, giring û Pîroz bûye. Gelê me yê Kurd li seranserî heremên xwe yên dîrokî, çî li Çiyayê Kurmênc, Kobanê yan jî li Cizîrê, rêxistina xwe ya nûhatî hembêz dike, di dil û çavên xwe de wê diparêze û hemî egerên jiyana û pêşveçûnê jê re amade û pêşkêş dike. Gelê me yê Kurd li Sûriyê, bi comerdî, qehremanî û mêrxasî erkên xwe yên netewî Sûrî pêk tîne, ji bo azadî û rûmeta welatê xwe yê hevpişk qurbanên giran datîne. Bi serokatî û rêbertiya lehengê Kurd ê payebilind **Yûsif El-ezme** artêşa Sûriyê a bi rêk û pêk tê damezirandin, paşê, ew bi xwe, li hemberî artêşa Firensî ya dagîrker derdikeve qada şer û li devera Meselûnê jiyana xwe ji dest dide, kevîr, deşt û newalên Meyselûnê bi xwîna wî û ya hevalbendên wî sor dibin, ji gelê Sûriyê bi tevayî re, dibine sembol û nîşana serfiraziyê. Herweha, li heremên xwe yên dîrokî, li kêleka birayê xwe yê Ereb, wî

beşdariyeke bihêz û berfireh di serhildan û şoreşên azadkirina welêt ji hêzên dagirker ên biyanî de kiriye. Herwisa wî beşdariyeke erênî ya berbiçav di avakirin û pêşvebirina welatê xwe Sûriyê di hemî warên jiyana de kiriye.

Lê mixabin, geşbûna ramanên tuxumperstî yên şoven li nik siyasetvanên Ereb û piştire jî serdestiya Parta Bas ku derheqa gelê me yê Kurd pîlanên tunekirin û hilqetandinê ajotine, hebûna wî weke miletekî xweser ku hevparê vî welatî ye dane mendelê, ziman, folklor û toreya wî qedexe kirine û pirojeyên ne mirovane dijî wî pêk anîne.

Tevî perçebûn û rewşa awarte ya tevgera me ya netewî, tevî tîrên jehrîn yên ji hawîr ve dibarin û di laşê wê de li ser hev dişkin, tevî gef, dek û dolabên xapînoker ên rijêmê, tevî ne baweriya me bi vê rewşa belavbûnê, bawerî û hêviya me li cî ye ku berê gel û tevgera me li pêş e. Bêgoman, tevî evqas rêl û kelem û dijwarî, bê dudilî ewê ber bi armancên gelê me ve here.

Di vê bîranîna pîroz de, gurzek gul ji giyanê damezrêner û hîmdarên vê tevgerê re diyarî dikin û em nav di keç û lawên gelê xwe didin, bila ew bêhêvî nebin, û her berê wan li pêş û serê wan li jor be, ji ber ku bêhêvîtiya mirovan mirina wan e.

*Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê  
me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de*